Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :471 www.ronahi.net/ku/ 19- Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî







## 105 endamên HPC'ê dest bi perwerdê kirin

Li Eyn Îsa bi beşdariya 105 endamên Hêzên Parastina Civakî dewreyeke nû ya perwerdeyê dest pê kir.
Bi armanca bilindkirina asta amadekirin û xurtkirinê ya endamên Hêzên Parastina Civakê li navçeya Eyn Îsa ya girêdayî Girê Spî, dewreyeke perwerdeyê bi beşdarbûna 105 endaman, hate vekirin. Dewre wê 7 rojan dewam bike. Wê dersên bîrdozî, leşkerî û sporê werin dayîn. Wê şervanên QSD`ê perwerdeyê bidin endamên HPC`ê.
Endamê rêveberiya Hêzên Parastina Civakî li Eyn Îsa Mihemed Enwer wiha got: "Ji ber ku endamên HPC'ê ji welatiyên navçeyê ne û danûstandinên wan bi gel re hene, divê perwerdeyên exlaqî û meslekî bibînin ku hemû pirsgirêkan çareser bikin."
Hêzên Parastina Civakî ya navçeya Eyn Îsa di 7'ê Sibata 2017'an hate avakirin. HPC parastina hemû komîte û rêveberiyên navçeyê dike û kampa Eyn Îsa diparêze...
***ANHA***

## QSD`ê du dewreyên perwerdê bi dawî kir



Hêzên Sûriya Demokratîk li Akademiya Şehîd Sarya Ronahî û Akademiya Şehîd Fiyad El-Şiblî dewreya çaremîn a sekvaniyê û rakirina mayinan bi dawî kir.
Li Akademiya Şehîd Sarya Ronahî dewreya bi navê Dewreya Şehîd Hozan Dirbêsiyê ya sekvaniyê û li Akademiya Şehîd Fiyad El-Şiblî dewreya perwerdeyê ya bi navê Dewreya Şehîd Mazlûm Qamişlo ya rakirina mayinan bi tevlêbûna bi dehan şervanên ji herêmên cuda yên Bakurê Sûriyê bi dawî bûn. Di her du dewreyan de perwerdeyên leşkerî û birdozî hatin dayîn.
Di merasîma bidawîkirina her du dewreyan de bi dehan fermandarên QSD û şervanên YPJ`ê amade bûn. Di merasîmê de ji fermandarên QSD`ê Ehmed Sultan Ebû El-Erac axivî û bidawîkirina perwerdeyê li şervanan pîroz kir û bal kişand ser girîngiya rakirina mayinan ji bo parastina sivîlan.
EMÊ SIVÎLAN BIPARÊZIN
Şervanên ku beşdarî dewreyan bûn nêrînên xwe anîn ziman û diyar kirin ku ew ê bi her awayî sivîlan biparêzin.
Şervanê bi navê Ebdulsetar Mihemed ê ji gundewarên Dêrazorê ye û tev li dewreyê bûye, wiha got: "Bi armanca parastina sivîlan ji mayinên DAIŞ'ê ez tev li dewreyê bûm. Ji bo parastina sivîlan em amade ne canê xwe feda bikin."
Ebdulsetar destnîşan kir ku çeteyên DAIŞ'ê li gundewarên Dêrazorê gelek mayin li gund û bajarokan çandin û ew jî derketina sivîlan ji wan herêman asteng dike.
Ebdulsetar wiha got: "Piştî qewirandina DAIŞ'ê ji gundan, çete mayinan li malên sivîlan, li ser rêyan û cihên giştî diçînin. Erka me ye ku em mayinan bê bandor bikin û sivîlan biparêzin."
Şervanê bi navê Basêl El-Elî wiha axivî: "Bi dawîbûna dewreyê re em awayên bêbandorkirina mayinên DAIŞ'ê fêr bûn. Em amade ne herêmên xwe ji mayinên DAIŞ'ê ku bûn sedema mirina sivîlan, paqij bikin."...
***ANHA***





Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 471 19- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## 6 dagirker li Efrînê hatin kuştin



Li Efrînê çalakiyên şervanên YPG'ê li dijî dagirkeran berdewam dike. Şervanên YPG'ê bi van çalakiyan derbên giran li leşker û çeteyên dagirker didin. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku di çalakiyên 16-17'ê Cotemehê de ku hatin lidarxistin de herî kêm 6 çete li Efrînê hatine kuştin, 5 jî birîndar bûne. ***R-2***

# BILA DAWÎ LI TECRÎD Û BÊ HIQÛQIYÊ WERE


**Dewleta Tirk ya dagirker di şexsê Rêber Ocalan de li dijî gelê Kurd bi her awayî şerekî qirkirinê bi rêve dibe. Ev 20 sale Rêber Ocalan di bin tecrîdê de ye û nikare bi derve re têkilî deyne. Têkoşîn û berxewedana gelê Kurd ya ji bo azadiya Rêber Ocalan jî dewam dike.**

### BILA RÊBER OCALAN AZAD BE

Hiqûqnasên herêma Şehba û Efrînê li kampa Serdem bi daxuyaniyekê tecrîda li ser Rêber Ocalan û bêdendiya navnetewî şermezar kirin. Hiqûqnasan xwestin tavilê Ocalan serberst were berdan. Hevseroka Yekîtiya Parêzeran a Kantona Cizîrê Xedîce El-Brahîm jî diyar kir ku li Îmraliyê îşkence li Rêber Ocalan tê kirin û xwest dawî li bê hiqûqiya li dijî Ocalan bê anîn. ***R-2***

### EM Ê LI SER RÊYA OCALAN BIMEŞIN

Malbatên şehîdan ên bajarê Qamişlo jî tecrîd şermezar kirin û diyar kirin ku gelên Bakurê Sûriyê bi saya felsefeya Ocalan li hemberî êrîşan xwe parastin û diyar kirin ew ê li dijî tecrîdê têkoşîna xwe berdewam bikin. Jinên Efrînê yên ku li Şehbayê bi cih bûne tecrîda şermezar kirin û diyar kirin ku ew ê heta dawiyê li ser rêya Rêber Ocalan bimeşin. ***R-2***



## Efrîn wê bi hêz û îradeya jinan azad bibe



Bi hezaran jinên kantona Hesekê bi meşeke girseyî li dijî dagirkeriya Tirk derketin û piştgiriya xwe bi berxwedana Efrînê re nîşandan. Meşa ku veguherî mîtîngê de axaftin hatin kirin û hat gotin ku ew ê Efrîn bi hêza têkoşîna jinan were rizgarkirin. ***R-2***

### Bila dagirker ji Efrînê werin derxistin



Partiyên siyasî û saziyên sivîl ên bajarê Helebê, kiryarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li Efrînê bi daxuyaniyekê şermezar kirin û diyar kirin ku Efrîn li ber çavên cîhanê hate dagirkirin. Di daxuyaniya ku bi zimanên Erebî, Kurdî , Tirkî û Îngilizî hat xwendin de hat xwestin ku dagirker ji Efrînê werin derxistin. ***R-5***




### Fermandarên QSD'ê û rûspiyên eşîreya El-Umeyrat li hev civiyan

Fermandarên QSD`ê û Endamên Buroya Têkliyên Giştî ya QSD`ê bi armanca xurtkirina têkliyan û nirxandina rewşa dawî li Sirrînê bi rûspiyên eşîra El Umeyrat re civiyan. Di civînê de fermandarên QSD'ê û rûspiyên eşîrê axivîn û ji bo parastina herêmê girîngiya hevgirtinê anîn ziman. ***R-2***

### QSD'ê pêşî li komkujiyên li Elmanyayê girt

Çeteyê DAIŞ'î yê Tirk li girtîgehên li herêmên QSD'ê ku girtî ye destûr hate dayin ku bi nûçegihanên saziyên Elman NDR, WDR û Suddeûtscher Zeîtûngê re biaxive. Çeteyekî DAÎŞ'ê bi navê Ogûz G. diyar kir mîna êrîşên li Fransayê wan plan dikir ku li Elmanyayê jî komkujiyeke mezin pêk bînin. Lê di encama têkoşîna QSD'ê de çeteyên ku wê komkujî bikira nekarîn xwe bigihînin Ewropayê. ***R-5***

### Paqijiya etnîkî û komkujiya li Efrînê wê ji wanre nemîne




Mûrat Karayilan bêdengiya raya giştî ya navneteweyî ya li pêşberî dagirkirina Efrînê rexne kir û diyar kir ku li herêmê paqijiya etnîkî tê kirin. Karayilan wiha got, "Bila gelê me û her kes baş zanibe, wê hesab ji hewldanên qirkirinê yên faşîst were pirsîn. Paqijiya etnîkî, komkujî û tehcîr wê ji wan re nemîne." ***R-4***

### QSD'ê bi rizgarkirina Reqayê cîhan ji belaya terorê xelas kir



Bi wesîleya salvegera yekemîn ya rizgarkirina Reqayê Endamê Desteya Serokatiyê ya MSD'ê Hesen Mihemed axivî û diyar kir ku di serî de dewleta Tirk gelek hêzan xwestin pêngava rizgarkirina Reqayê asten bikin da ku hebûna DAIŞ'ê li herêmê dewam bike. Mihemed got, "QSD'ê bi rizgarkirina Reqayê re hemû cîhan ji xetereya terorê rizgar kir." ***R-4***

### Aloziya Sûriyê wê bi Netewa Demokratîk çareser bibe



PYD'ê bi armanca nîqaşkirina rewşa siyasî ya li Sûriyê civînek li Dêrikê lidar xist.Hevserokê PYD`ê Şahoz Hesen di civînê de axivî û diyar kir çareseriya aloziya Sûriyê bi projeya netewa demokratîk a ku li Rojava û Bakurê Sûriyê pêş dikeve, wê bi dawî bibe. ***R-4***

### Pisporên hiqûqê wê qedexeya li ser PKK'ê nîqaş bikin

Qedexeya li ser PKK'ê ya li Elmanyayê ketiye sala 25'an. Zerarên ku qedexeyê daye Kurdan û demokrasiya Elmanyayê wê bi konferansekê werin nirxandin. Konferans ew ê di 20'ê Cotmehê de li paytexta Elmanya Berlînê were lidarxistin. Hêjmareke zêde hiqûqnas wê beşdarî konferansê bibin. ***R-5***

# Hiqûqnasan ji bo Ocalan daxuyanî dan

**Nerazîbênên li dijî Tecrîda li ser Rêber Ocalan zêde dibin. Bi armanca şermezarkirian tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hiqûqnasên herêma Şehba û Efrînê li kampa Serdem daxuyaniyek dan. Di daxuyaniyê de hate gotin ku bi tecrîdê dixwazin gelê Kurd ji Ocalan dûr bixin.**



Bi armanca şermezarkirian tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Hiqûqnasên Mafên Mirovan li Şehbayê daxuyanî dan.
Di daxuyaniyê de Hiqûqnasên Mafên Mirovan a Herêma Şehbayê û herêma Efrînê amade bûn. Daxyanî bi zimanê Erebî ji aliyê Endama Meclîsa Giştî ya Bakur û Rojhilata Sûriyê Narîman El Hisên û bi zimanê Kurdî ji aliyê Cîgira Hevseroka Meclîsa Gundê TelQirah Muhemed Ebdo ve li kampa "serdem" hate xwendin.
Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Dewleta tirk a dagirker siyaseta xwe ya dijmantiyê li ser gelê kurd dewam dike. Her wiha bi girtina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Dewleta AKP'ê bi hevkariya Dewletên Navnetewî dixwaze ku gelê azadîxwaz yê ku bi fikir û felsefeya Rêber Apo hatî girêdan dûr bixîne. Ev bêdengiya Mafê mirovan a li ser îradeya gelê kurd sînora zagonan şikandiye ya herî dawî jî cezaya disîpilîn ya ku li ser Rêber Apo hatiye dayîn e. Em vê yekê şermezar dikin û em dibêjin ji bo jiyanek azad û serbixwe divê Rêber Apo azad bibe."

## Efrîn wê bi hêz û îradeya jinan azad bibe




Bi hezaran jinên kantona Hesekê bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan meşek li dar xist û gotin, "Efrîn wê bi saya îrade û hêza jinên azad rizgar bibe."
Kongreya Star a kantona Hesekê bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan meşeke girseyî li dar xist. Bi hezaran jinên kantona Hesekê tev li meşê bûn. Meş ji ber avahiya Meclisa Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) a navçeya Til Temirê dest pê kir. Di meşê de pankartên bi nivîsên şermezarkirina bêdengiya navdewletî ya li hember dagirkeriya li Efrînê hatin hildan. Meş li Stada Şehîd Bilind veguherî mitîngê. Di mîtîngê de yek ji rêveberên Koordînasyona Kongreya Star Mûna Yûsif axivî û destnîşan kir ku dewleta Tirk a dagirker bi hincetên derew Efrîn dagir kir, kiryarên mîna revandin, kuştin û tecawiz kirin û li beramberî vê yekê jî hemû hêzên navneteweyî bê deng in. Bi bêdengiya xwe îsbat kirin ku destê wan jî di dagirkirina Efrînê de heye.
Mûna diyar kir ku gelê Efrînê û şervanên YPJ/YPG`ê li hemberî êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li ber xwe dan û ji hemû cîhanê re îsbat kirin ku her çi bibe jî lê Efrîn wê rizgar bibe û heta niha berxwedan didome.
Mûna di axaftina xwe de diyar kir dewleta Tirk a dagirker demografyaya herêmê diguhere, malbatên çeteyan li şûna niştecihên resen bi cih dike û bi vê yekê dixwaze serdema Osmaniyan ji nû ve li herêmê vejîne.
Mûna Yûsif di dawiyê de diyar kir ku Efrîn wê bi saya îrade û hêza jinên azad rizgar bibe…*ANHA*

## 6 dagirker li Efrînê hatin kuştin



Navenda Ragihandinê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku di çalakiyên du rojên dawî de herî kêm 6 çete li Efrînê hatine kuştin, 5 jî birîndar bûne.
Navenda Ragihandinê ya YPG'ê diyar kir ku çalakî 16-17'ê Cotmehê li navçeya Şêrawa ya Efrînê hatine kirin.
Di daxuyaniya nivîskî de ev agahî hatin dayin: "Hêzên me 16'ê Cotmehê li gundê Qimarê yê navçeya Şêrawayê li dijî koma çete ya bi navê Firqet Hemze çalakiyek pêk anîn. Di çalakiyê de 4 çete hatin kuştin, 3 jî birîndar bûn. 3 ji çeteyên hatine kuştin ev in: Abdullah Marî, Mûhammed Suleyman, Ebû Yakûb Hamza.
Yekîneyên me roja 17'ê Cotmehê li gundê Kefr Nebo ya navçeya Şêrawayê li wesayiteke leşkerî ya koma çete ya bi navê Feylaq Şam xistin. Di çalakiyê de 2 çete hatin kuştin, 2 jî birîndar bûn.

## Bi têkoşînê ew ê tecrîd bê şikandin



Malbatên şehîdan ên bajarê Qamişlo destnîşan kirin ku Rêber Ocalan girtîgeha Îmraliyê veguherand dibistaneke ji bo azadiya gelan û komplo têk bir.
Nerazîbûnên li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan dewam dikin.
Malbatên şehîdan ên bajarê Qamişlo tecrîda li ser Ocalan û li hember vê jî bêdengiya navnetewî şermezar kirin.
Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan ê bajarê Qamişlo Meîsûm Hesen got: "Komploya Navdewletî li dijî vîna gelên Rojhilata Navîn pêk hat."
Meisûm destnîşan kir ku komplo bi saya xeta berxwedanê ya ku Ocalan xêz kiriye, têk çû. Meisûm diyar kir ku Ocalan girtîgeha Îmraliyê vegerand dibistaneke ji bo azadî û xwîşk û biratiya gelan û got, "bi têkoşîn û berxwedana Rêber Ocalan ya li Îmraliyê komploya navnetewî têk çû."
Meisûm bal kişand şoreşa Bakurê Sûriyê û destnîşan kir ku gel di şoreşê de fikrên Ocalan ji xwe kirine bingeh û got: "Gelên Bakurê Sûriyê bi saya felsefeya Ocalan li hemberî êrîşên li dijî herêmê li ber xwe dan.1
Endama Meclisa Malbatên Şehîdan Leyla Mihemed jî tecrîda li ser Rêber Ocalan û li hember vê bêdengiya navnetwî şermezar kir. Leyla diyar kir ku divê rêxistinên navdewletî ji bo Ocalan bi erkên xwe rabin û got, "Heta şikandina tecrîdê em ê têkoşîna xwe berdewam bikin. "…*ANHA*

## De Mistûra jî diçe, lê aloziya Sûriyê dewam dike



Steffan De Mistûra diyar kir ku ji ber sedemên malbatî wê di dawiya Mijdarê de ji erka xwe îstîfa bike.
Nûnerê Neteweyên Yekbûyî yê Sûriyê Sûriyê Stîfan De Mistûra ragihand ku ji ber sedemên malbatî wê di dawiya Mijdarê de ji erka xwe îstîfa bike.
De Mistûra da zanîn ku tevî destkeftiyên serokê rêjîma Sûriyê Beşar El-Esed lê hê jî çareseriya siyasî ya herî girîng e.

## Fermandarên QSD'ê û rûspiyên eşîreya El-Umeyrat li hev civiyan

Fermandar û Endamên Buroya Têkliyên Giştî ya QSD`ê û rûspiyên eşîra El-Umeyrat li hev civiyan.
Fermandarên QSD`ê û Endamên Buroya Têkliyên Giştî ya QSD`ê bi armanca xurtkirina têkliyan bi eşîrên herêmê re, her wiha ji bo nirxandina pêşketinên dawî li bajarokê Sirrînê yê başûrê kantona Kobanê, civînek li dar xist.
Bi dehan rûspiyên eşîran tev li civînê bûn. Konê civînê bi wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û ala QSD`ê hate xemilandin.
Ji fermandarên QSD`ê Ezîz Ereb û Îbrahîm Hemze axivîn û rola QSD`ê ya di parastina Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin.
Serokê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê yê buroya herêma Firatê Azad Oso, Rûspiyê Eşîra El-Umeyrat Abdullhenan Umer û bi navê malbatên şehîdan ên eşîra El-Umeyrat Şêx Hisên axivîn.
Kesên axivîn girîngiya hevgitina gelê Sûriyê li hemberî gefên li ser herêmên anîn ziman.
Hate gotin ku parastina ewlehiya Sûriyê ji hemû pêkhateyên gelê Sûriyê tê xwestin…*ANHA*





# Hunermendan piştgirî dan Berxwedana Serdemê

**Bi dehan hunermendên Kantona Kobanê ji bo piştgiriya Berxwedana Serdemê şahiyek lidarxistin. Şahî bi pêşengiya Navenda Çand û Hunerê ya Baqî Xido pêk hat. Hunermendan di şahiyê de axivîn û diyar kirin ku çawa dagirker li Kobanê têk çûn wê bi heman rengî li Efrînê jî têk biçin.**



Bi pêşengiya Navenda Çand û Hûnera Baqî Xido, hunermendên Kobanê bi armanca piştgiriya Berxwedana Serdemê şahiyek lidar xistin.
Şahî bi tevlêvbûna bi sedan kesî li Baxçeyê 19`ê Tîrmehê ya navenda bajarê Kobanê hate lidarxistin.
Di şahiyê de li ser navê navenda Çand û Hûnera Baqî Xido Osman Bekî bi xêrhatina mêvanan kir û wiha got: "Em weke tevgera çand û hûnerê em ê bi hunera xwe û bi çanda xwe cihê xwe di Berxwedana Serdemê de bigirin û em ê bersiva dijmin bi hûnera xwe bidin."
Paşê li ser navê Desteya Edeletê Bekirî Ceradê axivî û wiha got: "Em bi qehremaniya şervanên xwe li Kobanê bi ser ketin û em ê li Efrînê jî bi ser bikevin. Em tu carî dev ji Efrînê bernadin."
Yek ji welatiyên Efrînê Xezal Şêxmûs jî axivî û diyar kir ku çawa ku dijmin li Kobanê bi binket, wê li Efrînê jî têk biçe.
Piştî axaftinan, hunermendan bi stranên xwe destek dan Berxwedana Serdemê …*ANHA*

## Pêşengeha Şopdarên Rojê li Serêkaniyê ye




Bi pêşengiya Navenda Çand û Hûnera Baqî Xido, hunermendên Kobanê bi armanca piştgiriya Berxwedana Serdemê şahiyek lidar xistin.
Şahî bi tevlêvbûna bi sedan kesî li Baxçeyê 19`ê Tîrmehê ya navenda bajarê Kobanê hate lidarxistin.
Di şahiyê de li ser navê navenda Çand û Hûnera Baqî Xido Osman Bekî bi xêrhatina mêvanan kir û wiha got: "Em weke tevgera çand û hûnerê em ê bi hunera xwe û bi çanda xwe cihê xwe di Berxwedana Serdemê de bigirin û em ê bersiva dijmin bi hûnera xwe bidin."
Paşê li ser navê Desteya Edeletê Bekirî Ceradê axivî û wiha got: "Em bi qehremaniya şervanên xwe li Kobanê bi ser ketin û em ê li Efrînê jî bi ser bikevin. Em tu carî dev ji Efrînê bernadin."
Yek ji welatiyên Efrînê Xezal Şêxmûs jî axivî û diyar kir ku çawa ku dijmin li Kobanê bi binket, wê li Efrînê jî têk biçe.
Piştî axaftinan, hunermendan bi stranên xwe destek dan Berxwedana Serdemê …*ANHA*

## Divê xwarinên xwezayî û Kurdewarî bên amadekirin







Pisporên çêkirina xwarinan diyar dikin ku divê civak bala xwe bidin ser xwarinên xwezayî û Kurdewariyê. Pisporan diyar kir ku rojane gelek kes ji ber xwarinên amade kirî nexweş dikevin, ji bo vê pêwîste civak dîsa vegere ser xwarinên xwezayî û Kurdewarî.
Pispora çêkirina xwarinên Kurdewarî Rengîn Marif li ser feydeya xwarinên Kurdewarî û xwezayî axivî. Rengîn diyar ku bikaranîna xwarinên Kurdewarî gelek girînge, bi taybet ew xwarinên ji giyayên xwezayî tên çêkirin. Rengîn wiha got; "Ev xwarinên xwezayî bûne pêwîstiyek gelek girîng yên jiyanê, ji ber ku li gorî tezên zanistî jî îspat bûye ku xwarinên amade gelek madeyên kîmyewî di nav de hene. Ev jî zererek mezin ji bo tendirûstiya mirovan çêdike. Dema ku em xwarinên kurdewarî dibînin, em gelek jê piştrastin û em dizanin kê çêkirine. Ev jî di aliyê derûnî de me aram dike û ti tirsek me ji xwarinê namîne. Berevajiyê wî dema ku xwarinên amadekirî em dibînîn em jê ne piştrastin. Ji bo vê divê em hertim xwarinên xwe bi xwe çêkin û xwezayî bin."
Rengîn diyar kir ku gelek kes hene ku bala xwe dane ser xwarinên amade kirî û wiha dewam kir; "Bi karanîna xwarinên amade, kiriye ku gelek nexweşî derbikevin û belav bibin. Nexweşiyên derdikevin çareseriya wan gelek zehmete. Lê hê jî ne derenge em hemû vegerin ser çêkirina xwarinên Kurdewariyê."
Pisporê berhemên çandiniyê Burhan Şêx Ezedîn jî li ser vê mijarê axivî û diyar ku li hemû welatên cîhanê girîngî ji bo xwarinên xwezayî tê dayîn û wiha got; "Ji ber ku di xwarinên xwezayî de madeyên kîmyewî nayên bikaranîn, ger hebe jî gelek kême. Gelek sûdê xwarinên Kurdewariyê heye, di aliyê tendurûstî û derûniyê de jî gelek başe. Ji bo vê pêwîste em hemû vê girîngiyê bizanin, çend em nêzîkî xwarinên xwezayî bin wê ewqas pirsgirêkên tendurûstiya me jî başbe.
Em her roj dibînin gelek mirov ji ber xwarinên amade nexweş dikevin. Ji bo vê divê em civakê ji bo vê yekê hişyar bikin, divê civak bizane ku xwarinên amade ne başin û bala xwe bidin ser xwarinên Kurdewarî û xwezayî."…***ROJNEWS***



## Cudahiya siyasetmedar û hunermend

Rotînda YETKÎNER

Huner û siyaset her çiqasî, ji hev pir cuda nebin jî, di gelek waran de ji hev gelek dûr in. Divê em nezikatî û dûriya siyaset û hunerê tim di bîra xwe da zîndî bihêlin.
Çawa ku di siyasetê de kesên tenê ji bo berjewendiyên xwe ên kesayetê hene û ev kesana wek şovmenên şow dikin tim li pêşin, mixabin di hunerê de jî ev kesan gelek in.
Çawa ku di siyasetê de, kesên li gor hêzên serdest û desthilatan tevdigerin hene û her dayîm hevalbendên zorê ne, di hunerê de jî ev kesana gelek in û qirêjiyê pirranî ev kesana dixin nava hunerê.
Çawa ku di siyasetê de kesên mîllîtan hene û her dem li kêleka rastiyê, hevalbendên kedkaran û bo gelên bindest û kedkar kar dikin; di hunerê de jî gelek hunermend bi vî rengî hunerê dihûnin hene.
Yanî dixwazim bêjim em nikarin siyaset û hunerê ji hev biqetînin an ji hev zêde cuda bibînin. Lê em nikarin huner û siyasetê jî bikin wek hev. Raste divê taybetmediyên hunermed û siyasetmedar ne wek hev bin, lê ji hev gelek jî dur nîn in. Cûdahiya herî mezin a hunermend û siyasetmedar, divê hunermend mejî û hestên xwe, berê her tiştî ji bo rastiya hunerê bi kar bîne. Dûre li gor prensîbên siyaset a ku baweriya xwe pê aniye naveroka berhemên xwe tijî bike.
Siyasetmedar dikare derewan bike û ne li gor fikrê ku sedî sed raste tevbigere, lê hunermend nikare tiştek wisa bike, ger bike wê demê arabesk a qirêj wî-wê dorpêç dike.
Siyasetmedar dikare ji bo menfaetê siyaseta rojane, gelek pirensîbên xwe veşêre û heta demek ne li gor wan prensîbên xwe tevbigere; lê hunermend nikare ve yekê pêkbîne, ger pêkbîne ew dem berhemên dihûne ne huner e, sloganên hundir vala ye.
Siyasetmedar dikare, li gel siyasetek ku tenê di çend xalan de dikarin bi hevre bimeşin de, hevgirtinek demî pêk bîne. Le ger hunermend tiştek wisa pêk bîne, êdî ji berhemên ew pêktîne, bêhna hunerê dertê û ew ne huner e.
Siyasetmedar dikare raste rast derewan bike ji bo berjewediyên giştî polîtîkayên bawerî pê tîne û ev kiryar di dem kurt de qezence ji bo siyasetê. Lê ger hunermend ji bo demekê derewanb bike û li gor vê derewê hunerê bihûne, ev ne hunere, ev huner kujiye.
Kurt û cewher, siyaset û huner di warê prensîban de ji hev gelek cudane, lê hunermend û siyasetmedar na. Yanî kesên ku ideoloji an jî siyasetekê bipejirîne, dikare di wê warî de hunera xwe li gor piresîbên hunerê bihûne. Ger hunermend ji bîr neke ku huner her dayîm û bê sînor ji bo xweşikbûn, gerdûn, xweza û mirovahiyê karek bêhempaye, wê demê ew ê ji prinsîbên hunerê tawîz nede. Ger hunermendek ku ji xwe re dibêje hunermend, huner ne fêmkiribe, wê bê şik bikeve xizmeta hêstên erzan û populîst.


# Li Reqayê amadekariyên pîrozbahiyê

**Bi boneya salvegera yekemîn ya rizgarkirina Reqayê amadekariyên pîrozbahiyê tên kirin. bajarê Reqayê ku 4 salan di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de ma û weke paytexta xwe ragihandinbûn di 17'ê Cotmeha 2017'an de ji aliyê QSD'ê de hat rizgarkirin. Niha welatî xwe ji bo şahiya roja ji xilasbûna tarîtiyê re amade dikin.**



Şaredariya Gel a Reqayê bi hatina salvegera yekemîn a rizgarkirina bajêr kar û xebatên xwe zêde kiriye.
Şaredariya Gel a bajarê Reqayê bi hevkariya Tîmên Destwerdana Lezîgn bi boneya salvegera yekemîn a rizgarkirina bajêr ji çeteyên DAIŞ`ê, dest bi sererastkirina Çerxerêya El-Neîm kir ku çeteyên DAIŞ`ê ew kiribû "Çerxerêya El-Cehîm". Projeya sererastkirinê wê di nava 3 mehan de bi dawî bibe.
Ji aliyê din ve jî şaredariyê werşeyên kesixandina daran li hemû bajarên Reqayê û derdora wê belav kirin da ku bajarê wan xweşik bibe, her wiha xebatkarên paqijiyê yên şaredariyê rojane bajarê xwe ji çop û sergoyê paqij dikin.
Hevserokê Şaredariya Gel a Reqayê Ehmed El-Îbrahîm diyar kir ku bi boneya salvegera yekemîn a rizgarkirina bajarê Reqayê ji çeteyên DAIŞ`ê wan dest bi sererastkirina Çerxerêya El-Neîm a di nava 4 salên dagirkeriya çeteyên DAIŞ`ê de bûbû mînaka tarîtiyê, kir…*ANHA*

## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Hevjiyana Azad -7-

**Abdulah Ocalan**

Li gorî vê vegotinê hemûyî qada divê pêşî bi zanistî mirov pê dakeve, qada hevjiyanê ye. Mîtolojiya serdema destpêkê ya gelekî hov tê dîtin û dîn timî ji vê qadê dest pê dikin û ev bêsedem nîne, ji ber ku bi heqîqeta civakî re têkildar e. Hevjiyan, nexasim zanista li dora jinê were pêşdebirin, wê bibe gava pêşî ya ber bi sosyolojiya rast ve bê avêtin. Ne bi tenê weke zanist di sosyolojiyê de, divê di tevahiya qadên hunerî û felsefî de gava pêşî di van têkiliyan de bê avêtin. Jixwe hewce nake ku mirov bibêje, dîn û exlaq weke şaxekî felsefeyê divê pêşî di vê qadê de gavê biavêjin. Exlaq û dîn têra xwe bi vê qadê ve xwe girêdane.
Weke encam mirov dikare bibêje, di serdema me de têkçûna hêzên mêtinkar û desthilatdariya hegemonîk herî zêde bi hilweşîna di warê hevjiyanê de xuya dike. Têkiliya jin û mêr ewqasî deklase bûye, maneya xwe ji dest daye, ne bêyî wê dibe ne bi wê dibe ango êdî li ber qedandinê ye. Yên şoreşa destpêkê nesipêrin analîza vê rewşa kaotîk, bêgav wê kaosê dewam bikin. Kesên şexsî yan jî kolektîf gavê diavêjin, eger vê qadê di warê zanistî, felsefî û hunerî de bikin bingeh, bi tenê hingê dikarin ber bi hevjiyana azad ve gava xwe biavêjin. Ev gavên pêşî yên bêne avêtin, weke ku gelek caran yeqîn tê kirin, gavên taybet ên di navbera du kesan de têne avêtin nînin, der barê civaka sosyalîst demokratîk a bê pêkanîn de gavên pêşî yên gerdûnî ne.
Sosyalîstbûn, beriya her tiştî di hevjiyanê de divê bi asta azadiyê re têkildar be. Divê mirov şêwazekî jiyanê bike bingeh, çawa ku pratîkên wê yên dijwar û bi pîvan di destpêka jiyana mîtolojiya kevin û dînî de dihatin dîtin. Kengî mirov karibe ji şêwazên jiyanê yên sîstemên şaristaniyê û modernîteya kapîtalîst ên mirovan kedî dikin bibihure, hingê dikare hevjiyana sosyalîstwarî ava bike. Ti têkiliya hevjiyanê bi seksualîteya banalîst a sîstemê re, bi lîstika malbatokê re, bi dewamkirina zurriyetê re û tevahiya temenekî bi 'serdanîna ser balgiyekê' re nîne. Nexasim ti eleqeya xwe bi têkiliyên cinsî re tineye ku bi temamî bûne nexweşiyeke rojane. Jixwe li cem ti ruhber û zindiyekî din rojane têkiliya cinsî nîne. Berevajî li cem zindiyên din ev li ser bingehekî demî pêk tê û ev jî piştrast dike ku têkiliya cinsî ya li cem mirovan bi şêwazekî civakî hatiye çêkirin. Di warê têkiliya cinsî de birçîbûn û dîsa di vî warî de sînor derbaskirin, têkiliya xwe bi desthilatdariya hegemonîk û avakirina şêweyê civakî re heye. Cinsiyetparêziya mêr a li ser jinê tê ferzkirin bi tevahiya şêweyên xwe weke desthilatdariyekê xwe diyar dike. Cinsiyetparêziyên bi vî rengî mirovan bextewar nakin, bihêlin bextewarkirin û şadkirinê, berevajî bi temamî çavkaniyeke nexweşî û xemgîniyê, qedandin û mirina zû ne. Binyeya ti jin û mêrî bi têkiliya cinsî ya bi vî rengî re li hev nake. Nexasim cinsiyetparêziya ku kapîtalîzm bi reklamkariya jinê gij dike, bi temamî têkiliya xwe bi hegemonya îdeolojîk re heye û bi vê jî qanûna kara herî zêde misoger dike. Mirov dikare bibêje, ti têkiliya civakî bi qasî cinsiyetparêziyê nikare sîstemê hilgire. Lewma ji bo mirov karibe bibe antî-kapîtalîst divê karibe vî şêwazê jiyanê yê cinsiyetparêz red bike û jê bibihure.

# Meclisa Lihevanînê li gorî pîvanên edaleta civakî tev digere



Meclisa Lihevanînê 5 salan de gelek doz û pirsgirêkên civakê bi rêya lihevanîn û rêgeza edaleta civakê çareser kirin.
Meclîsa Lihevanînê wekî komîteyeke lihevanînê ya biçûk a girêdayî Mala Gel dest bi kar kir, piştre mezin bû û niha gelek meclisên lihevanînê girêdayî wê ne.
Şoreşa gelan a Bakurê Sûriyê di demeke kurt de gelek pêşketin di aliyê pêkanîna edaleta civakî de pêk anî. Ji xebatên herî zêde ku bi rêya wan pîvanên edaletê dihatin bikaranîn, komîte û meclisên lihevanîna civakî ne.
Meclisa Lihevanînê ya navçeya




Girkê Legê ev zêdetirî 5 salan e hatiye avakirin. Gelek pêşketin di aliyê birêxistinkirina meclisê û çareserkirina bi sedan pirsgirêk û dozên civakî de pêk anîne.
Komîteya Lihevanînê di dawiya sala 2012`an de wek komîteyeke biçûk a girêdayî Mala Gel dest bi kar kir. Di wê demê de hemû doz û pirsgirêkên civakî li navçeyên Girkê Legê, Çilaxa, Til Koçer û gundewarên wê çareser dikirin.
Kar û xebatên Komîteya Lihevanînê yên ku paşê veguherîn Meclisa Lihevanînê û Edelata Civakî çareserkirina pirsgirêk û dozên civakî li gorî rêgeza edaleta civakê û kevneşopên di nava civakê de çareser dike bêyî ku tu kes were cezakirin.
Rêveber û endamên Meclisa Lihevanînê dibêjin berê meclisê bi awayekî rojane doz û pirsgirêkên civakî yên li ser pirsgirêkên malbatî, nakokiyên li ser parvekirina mal û milk, her wiha dozên tolhildanê (xwîndariyê) û hinek dozên tundiyê pêşwazî dikirin.
Endamên meclisê diyar dikin ku ew li gorî nêrîna civakê û ne li gorî dadgeh û cezayan tev digerin.
Di hemû pirsgirêkan de li her du aliyan tê guhdarkirin, paşê lêkolîn li ser dozê tê kirin û di dawiyê de pirsgirêk li gorî rizaya her du aliyên tê çareserkirin.
Kar û xebatên wan ne tenê çareserkirina pirsgirêk û dozên civakî yên rojane ye, lê belê gelek nakokiyên li ser rakirina tolê û kuştinê çareser kirine.
Li gorî yek ji rêvberên Meclisa Lihevanînê ya Girkê Legê Salih Ehmed komîteyê heta niha nakokiyên çend salan di navbera çend malbatan de çareser kirine.
Rêveberên Meclisa Lihevanînê ya Girkê Legê destnîşan kir ku komîteyê di destpêkê de pirsgirêkên civakî li navçeya Girkê Legê, Çilaxa, Til Koçer û gundewarên wê çareser dikirin. Bi armanca berfirehkirina xwe di aliyê rêxistinî de, komîte û meclisên xwe li hemû navçeyan ava kirin. Niha jî Komîteya Lihevanînê li Til Koçber, Çilaxa û Girkê Legê heye.
25 jin û mêr ji pêkhateyên Kurd û Ereb di Meclisa Lihevanînê ya Girkê Legê de dixebitin. Dema ku tê xwestin alîkariyê ji rûspiyên eşîran dixwazin. Her wiha hemû endamên meclis û komîteyên lihevanînê derbasî dewreyên perwerdeyê dibin da ku xwe di aliyê lihevanînê de xurt bikin.

### ROLA JINAN DI MECLÎSÊ DE SEREKE YE

Komîteya Lihevanînê ji jin û mêran pêk tê. Bi hev re dozan çareser dikin. Gelek dozên girêdayî jinan ji aliyê endamên jin ên meclisê ve hatine çareserkirin.
Ji rêveberên Meclisa Lihevanînê Sûmeya Bedro diyar kir rola jinan di Komîteya Lihevanînê de sereke ye. Sûmeya diyar kir ku dozên taybet ên jinan bi hevkariya Mala Jinan têne çareserkirin…*ANHA*

# Ji bo 42 gundan navenda tenduristiyê hate vekirin

Komîteya Tenduristiyê li gundê El-Muteriqê Mezin ê girêdayî bajarê Minbicê navenda tenduristiyê ji nû ve vekir.
Komîteya Tenduristiyê ya girêdayî Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a bajarê Minbicê û gundewarên wê li gundê El-Muhteriqê Mezin ê girêdayî bajarê Minbicê ji bo ku xizmetên tenduristiyê bide 42 gundan navenda tenduristiyê ji nû ve vekir.
Komîteya Tenduristiyê bi hevkariya endamên Meclisa Xeta El-Muhteriq beriya mehekê dest bi sererastkirina navenda tenduristiyê ya li gundê El-Muhteriq kir.
Di navenda tenduristiyê de beşên ambulans, jin û zarok û her wiha dermanxaneyek hene. Di navenda tenduristiyê de rojane 6 kes dixebitin.
Bi dehan endamên sazî, komîteyên sivîl, leşkerî yên girêdayî Meclisa Sivîl a Minbic û gundewarên wê û şêniyên gund tev li merasîma vekirinê bûn.
Di merasîma vekirinê de bi navê Meclisa Sivîl a Demokaratîk a Mibic û Gundewarên Wê hevseroka Meclisa Rêveber Nezîfa Xelo, bi navê Meclisa Xeta El-Muhteriq Dele El-Hisên û bi navê Komîteya Tenduristiyê Mûna Zekeriya axivîn.
Di axaftinan de vekirina navendê li hemû şêniyên El-Muheteriq û



gundên derdora wê hate pîrozkirin.
Mûna Zekeriya jî di axaftina xwe de tekez kir ku wê navendên tenduristiyê li hemû gundan vekin û diyar kir ku ew dixwazin bi rêya vekirina navendan xizmeta welatiyan bikin.
Di dawiyê de deriyê navendê ji



aliyê dayika şehîd Elî Şêr, Edla Îbrahîm ve hate vekirin…*ANHA*



# Li Reqayê ji bo jinan serdemeke nû

**Berdevka Meclîsa Jinê ya Reqayê Xewle El Îsa El Hemmûd bi boneya salvegera yekemîn a rizgarkirina Reqayê diyar kir ku ew bi hêza jinên Kurd hatin rizgar kirin. Xewle wiha got, "Piştî rizgarbûnê me dest bi xwe rêxistinkirinê kir. Jinên ku zilma DAÎŞ'ê dîtîne, daxwaza wan ji bo azadî û xebatê zêde ye."**



Berdevka Meclîsa Jinê ya Reqayê Xewle El Îsa El Hemmûd qala karê xwe yê rêxistinbûnê û ji nû ve avakirina Reqayê kir.
Xewle El-Îsa El-Hemmûd berdevka Meclîsa Jinê ya Reqayê ye. Xewle beriya ku DAÎŞ Reqayê dagir bike, xwendekar bû. Heta di wê demê de ku çeteyan navê Artêşa Azad li xwe dikir jî, tê bîra wê ku êdî derketina ji nava malê jî li jinê û pê re jî li wê hatibû qedexekirin. Xwendekara hiqûqê Xewle diyar kir ku xwendina wê weke, xwendina 'qanûna kafiran' hatiye binavkirin.
Ew paşê xwe fêrî dirûnê dike û destê xwe ji xwendina hiqûqê jî dişo, heta ku Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ji bo rizgarkirina Reqayê zend û bendan ba didin.
Xewle dibêje ew çarşefa reş û rûpoş bi xwe pirsigirêka mezin di dema dagirkeriya DAÎŞ'ê de nebû û wiha dipeyive: "Carekê ji bo cilûbergên me qanûn çêdikirin, her sal ew diguhertin. Piştre qedexeya derketina ji malê danîn û diviyabû ku dengê mirovan jî dernekeve. Jina ku li kolanê bimeşiya, cezayê pere lê dihat birrîn. Li gorî tişta ku li xwe nekiribe jî ev ceza zêde dibû. Ji bo me cilûberg ne pirsgirêk bûn, ew zexta ku li malbatên me dikirin, dikir ku zext bêhtir li me bibe. Wan kir gelek jin û mêr dev ji hev berdin. Wan ders didan zilaman û zilaman li mala xwe li ser hevjina xwe ew ders pêk dianî. Wan dixwest bi hinceta şerîeta Îslamî jinê ji her tiştî mehrûm bike."

### BI HÊZA JINA KURD

Rizgarkirina bajarê Reqayê û hêviya bi wan re peyde bûyî jî Xewle wiha îfade dike: "Rizgarbûna me bi destê jinê hat. Beriya wê em 5 mehan dorgirtî man, lê bi hêza jina Kurd em hatin rizgarkirin. Hembêza yekemîn ku ji me re hat vekirin a jina Kurd bû. Bi destên me girtin û em ji rewşa bindestiyê ber bi azadiyê ve birin. Ji cihê ku li jinê derketina derve qedexe bû, em hatin cihekî ku jin di bereya pêş de bê tirs şer dikin. Ruhê xwe fedayî azadiya jinên bindest dikirin.
Piştî rizgarbûnê, me nedizanî çawa mirov xwe birêxistin dike. Lê piştre, me dest bi avakirina komun û meclîsên giştî û yên jinê kir. Min pêşî ji xwe re digot, çima em di nava xebata giştî de ne jî. Piştre me her tişt fêhm kir. Min di nav komunên jinan de kar kir, ji jinan re got ka rêxistinbûyîn çi ye, komun çi ye. Me fêhm kir ku êşa jinan li her deverê weke hev e. Çi li Reqa çi li Dêra Zorê, Tebqa û Minbicê, pirsgirêkên jinan yek in. Jinên ku zilma DAÎŞ'ê dîtibin, daxwaza wan ji bo azadî û xebatê zêde ye."

### HÊVÎ JI NÛ VE AVA KIR

Xewle bi bîr xist ku hêza xweparastinê ya jinê ji bo wan tiştekî nû bû û nerazîbûna malbatan a destpêkê jî, piştî ku dîtin ka jin çiqasî exlaqî xwe diparêze ji holê rabûye. Xewle dibêje vê hêzeke xurt afirandiye û wiha dewam kir: "Me ji avakirina komun, meclîs û rêveberiya jinan dest pê kir û ji bo ku jin bê perwerdekirin û hişyarkirin, akademiyên perwerdeyê hatin vekirin.
Ji bo jinên Reqayê, ew tiştên nû bûn, ji ber ku em di nava civakeke dîlgirtî de mezin bûne. Rola jinê tenê di nav malê de bû, ti hêviya jinan nebû ku ji malê derkevin û dinyayê bibînin. Lê îro ev mumkin e. Ez mînaka vê me. Ez hatime cihekî ku jin ji hemû aliyên cîhanê hatine gel hev, ezmûnên xwe bi hev re parve dikin. Ji vê konferansa navneteweyî ya jinan tişta girîng a min derxistî ew e ku jin li ku devera cîhanê dibin bila bibin, pirsgirêk, hîs û eşên wan yek in."
Berdevka Meclîsa Jinê ya Reqayê Xewle El-Îsa El-Hemmûd işaret bi guherîna dewra jinê di nava civaka li Reqayê de kir ku êdî jin li bereyên pêş ên şer jî hene. Axaftina xwe bi vê hêviyê bi dawî kir: "Baweriya min bi hêza jinê zêde heye. Ez hevîdar im ku em ê weke jin bi hevgirtina xwe karibin jinan ber bi azadiyê ve bibin."…*Yenî Ozgur Polîtîka*



# Heta ku tecrîd hebe çareserî pêş nakeve

Parlamentera HDP'ê ya Amedê Salîha Aydenîz da zanîn ku heta Ocalan tecrîdkirî be di aliyê siyasî de li Rojhilata Navîn tiştek sererast nabe.
Tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi rengekî giran dewam dike. Di operasyonên qirkirina siyasî yên 9'ê Cotmehê de gelek endam û rêveberên HDP, DBP, KCD, TJA, DÎK û xebatkarên çapemeniyê hatin destgîrkirin. Li Midûriyeta Emniyetê ya li Amedê, hema bêjin ji hemû kesên hatin destgîrkirin re li ser tecrîdê pirs hatin pirsîn.
Parlamentera HDP'ê ya Amedê Salîha Aydenîz polîtîkaya tecrîdê ya dewleta Tirk û têkoşîna li dijî vê polîtîkayê nirxan û got, "Ji hevalên me yên destgîrkirî re li ser tecrîdê pirs hatin pirsîn. Ev yek nîşan dide ku faşîzm û dîktatorî li Tirkiyê bi cih dibe û tê xwestin, zext, şîdet û zilm bê dewamkirin. Ji ber ku, eger hevdîtin bi Birêz Ocalan re were kirin, wê bê dîtin ku felsefeya wî ya li Rojhilata Navîn belav bûye bibe hêvî ji hemû gelên cîhanê re. Lewma pirsên bi vî rengî dipirsin û hewl didin zextê li mirovan bikin. Baş zanin ku tecrîdkirina Birêz Ocalan tecrîdkirina tevahiya Rojhilata Navîn e. Di heman demê de girankirina şer e."

### NAXWAZIN TECRÎD BIKEVE ROJEVÊ

Aydenîz diyar kir ku eger tecrîdkirina Ocalan bidome wê di atmosfera heyî ya siyasî ya Rojhilata Navîn de tiştek sererast nebe û wiha got: "Dîktatoriya faşîst tecrîdê didomîne û dixwaze ji xwe re argumanekê biafirîne. Lewma naxwaze ku mirov tecrîdê bixin rojevê û ji bo rakirina tecrîdê çalakiyan li dar bixin. Dema ku mirov bala xwe didin ser rewşa heyî ya dewletan, tê dîtin ku ji bo berjewendiyên xwe biryarên siyasî didin. Û ji bo van biryaran bi cih bînin, divê lingên siyasî û civakî bişikînin. Ev jî partiyên siyasî, saziyên sivîl, jin û ciwan in. Ji ber vê yekê pêla destgîrkirinê mezin bûye."…*ANF*

# Jin wê heta dawiyê li pey Ocalan bin





Jinên kantona Efrînê ku li Şehbayê bi cih bûne, tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin û diyar kirin ku ew ê li ser rêya Rêber Ocalan bimeşin.
Dewleta Tirk tecrîdeke giran daniya li ser Rêber Ocalan û rê nade ku malbat û parêzer pêre hevdîtinê bikin.
Jinên Efrînê yên ku ji ber dagirkeriya dewleta Tirk li Şehbayê bi cih bûne tecrîd şermezar kirin û diyar kirin ku ew ê heta azadiya Ocalan têkoşîna xwe bidomînin.
JFatme Beko (70) ya ji gundê Celemê yê girêdayî navçeya Cindirêsê ye destnîşan kir ku wê di salên 80'yî de fikr û felsefeya Ocalan nas kiriye û wiha got: "Gelên Rojhilata Navîn fikrên Ocalan ji bo xwe qebûl kirine."
Têkildarî Komploya Navdewletî ya li dijî Rêber Ocalan Fatme wiha axivî: "Komplo ji roja destpêkê ve têk çûye, ji ber ku gel fikrên Ocalan ji xwe re kirine bingeh û li ser dimeşin."
Emîne Reşîd jî dayika şervanekî tevgera azadiyê ye û ji gundê Dêrswan ê navçeya Şêrawa ye. Dayika Emîne ji zêdetirî 30 sale fikr û felsefeya Ocalan nas kiriye û pê hatiye girêdan. Emîne wiha got, "Bi saya fikr û têkoşîna rêber Ocalan jinan tekoşîna azadiyê nas kir, ji zêhniyeta serdest rizgar bûn û karibûn xwe biparêzin."
Dayika Emîne wiha got: "Gelê Kurd wê heta dawiyê li ser rêya Ocalan têkoşîna xwe berdewam bike û ji bo azadiya Ocalan tekoşînê bilind bike."*ANHA*

# Bêdengiya DMME û CPT'yê fikaran zêde dike

Xedîce El-Brahîm diyar kir ku tecrîd şerma herî mezin a mirovatiyê ye û got,"Ji bo ev şerm bi dawî bibe divê demildest tecrîda giran a li ser Rêber Apo bi dawî bibe."
Di derbarê tecrîda giran a li ser Rêber Ocalan de Hevseroka Yekîtiya Parêzeran a Kantona Cizîrê Xedîce El-Brahîm axivî û wiha got: "Dema ku mijar dibe Rêber Apo wê demê gotina mafên mirovan tenê li ser qaxizê dimîne. Ev pêkanîn dijhiqûqî ye. Divê demildest dawî li vê dijhiqûqiyê bê."



### ÊŞKENCE LI RÊBER APO TÊ KIRIN

Xedîce da zanîn ku j ber ku kesên qaşo mafên mirovan diparêzin tenê berjwendiyên xwe difikin loma mijara tecrîdê jî paşguh dikin û wiha dewam kir, "Tenê dixwazin şer derkeve û ew jî çekên xwe bifiroşin. Ev bê edaletî ye. Hemû cureyên îşkenceyê li Rêber Apo tê kirin. Ew îrade û hêza bi milyonan mirovî ye. Divê li dijî vê îradeyê rêzdarî bê nîşandan û xalên ku di hiqûqê de cihê xwe digirin neyên binpêkirin."

### BÊDENGIYA DMME Û CPT

Xedîceyê da zanîn ku bêdengiya DMME'yê û CPT'ê êrikirina zilmê ye û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Biryarên ku derbarê Rêber Apo de tê dayin siyasî ye ne rast e. Dema ku rewş wiha be ev neheqî li milyonan mirovan dibe. Êdi bawerî bi tu kesî mirov nikare bîne. Bêdengiya DMME'yê û CPT'yê bi fikar e û zagon di bin bandora hêzên nîjadperest de ne. Divê hemû kesên ku dibêjin em mafê mirovan diparêzin li dijî vê tecrîdê bisekinin. Tecrîd şerma herî mezin a mirovatiyê ye. Ji bo ev şerm bi dawî bibe divê demildest tecrîda giran a li ser Rêber Apo bi dawî bibe. Dema ku mijar dibe Rêber Apo wê demê gotina mafên mirovan tenê li ser qaxizê dimîne. Ev pêkanîn dijhiqûqî ye. Divê demildest dawî li vê dijhiqûqiyê bê."…
*JINNEWS*

# QSD'ê cîhan ji belaya terorê xelas kir

**Bi wesîleya salvegera yekemîn ya rizgarkirina Reqayê Endamê Desteya Serokatiyê ya MSD'ê Hesen Mihemed axivî û diyar kir ku di serî de dewleta Tirk gelek hêzan xwestin pêngava rizgarkirina Reqayê asten bikin da ku hebûna DAIŞ'ê li herêmê dewam bike. Mihemed got, "QSD'ê bi rizgarkirina Reqayê re hemû cîhan ji xetereya terorê rizgar kir."**

Hesen Mihemed diyar kir ku bajarê Reqayê xwe bi xwe bi rêve dibe û pêşeroja xwe diyar dike. Salek li ser rizgarkirina Reqayê re derbas bû. QSD'ê di encama berxwedaneke mezin de bajar ji dagirkeriya DAIŞ'ê hat rizgar kirin.
Bi wesîleya salvegera yekemîn ya rizgarkirina Reqayê Endamê Desteya Serokatiyê ya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Hesen Mihemed axivî û diyar kir ku gelek hêzan xwestin pêngava rizgarkirina Reqayê asten bikin da ku hebûna DAIŞ'ê li herêmê dewam bike.
Mihemed wiha dewam kir,
Reqa ji bo hemû cîhanê xwedî girîngiyeke mezin e. Reqa bûbû navenda terorê û metirsiya wê li ser hemû dewletên cîhanê hebû. Li gelek dewletên Europayê mîna Fransa, Belcîka û Îngiltereyê êrîşên DAIŞ'ê pêk hatin. Lewma Reqa jî pêwîst bû ev metirsî bê rakirin. Reqa bûbû mêjiyê terorê. Derbarê mijara rizgarkirina Reqayê de, di navbera dewletên cîhanî û yên herêmî de gelek gotûbêj çêbûn. Her hêzekê dixwest di rakirina vê metirsiyê de rolekê bilîze. Hêza ku di rizgarkirina Reqayê de xwedî rol be, wê bikeve dîrokê. Ji ber cîhan



ji terorê û metirsiyê rizgar dike. Lewm Reqa ji bo hemû hêzan û ji bo rejîma Sûriyê jî girîng bû.
Hêza ku rola sereke girt ser xwe Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bû. Ji ber ku vê hêzê di pêvajoya rizgarkirina Kobanê de, diyar kir ku tenê ew hêz dikare rê li pêşiya DAIŞ`ê bigire. Piştî rizgarkirina Kobanê QSD`ê herêmên derdora Reqayê yên mîna bendava Tişrîn û Minbic û paşê jî Tebqa û gundewarên rojava û bakurê Reqayê rizgar kirin, lewma tenê QSD'ê dikaribû Reqayê rizgar bike.
Rizgarkirina Reqayê ji bo her kesî cihê serbilindiyê bû, pêwîst e hemû hêz, ên ku beşdarî rizgarkirinê nebûn jî, rejîm jî û hêzên herêmî jî, bi wê yekê serbilind bin ku QSD`ê Reqa ji metirsiyên mezin rizgar kir.
Hesen Mihemed li ser armancên dewleta Tirk yên dema rizgar kirina Reqayê de jî wiha axivî, Di rastiyê de armancên Tirkiyê ne rizgarkirina Reqayê bû. Cîhan hemû rastiya Tirkiyê dizane, dizane ku Tirkiye ew dewlet e ku têkiliyên wê bi DAIŞ`ê re hene. Dema ku DAIŞ`ê herêmên li ser sînorê Tirkiyê dagir dikirin hemû deriyên sînor ji bo wan vekirî bûn. Berî hemleya Reqayê dest pê bike, hemû dewletên cîhanê li ser wê yekê li hev kiribûn ku Tirkiye yekemîn hêz e ku alîkariyê dide çeteyên DAIŞ`ê. Hemû çeteyên derbasî Sûriyê bûn bi rêya balafirgehên Tirkiyê hatin. Tirkiyê her tim dewletên cîhanê bi DAIŞ`ê tehdît dikirin. Jixwe me hemûyan dît çawa piştî gefên Erdogan çalakiyên terorê li Parîsê dest pê kirin.
Tirkiyê dixwest destwerdana hemleya rizgarkirina Reqayê bike. Eger Tirkiye ketiba nava hemleya Reqayê, ev dihat wê wateyê ku gelên herêmê jî wê negihiştibana azadiya xwe.
Di pêvajoya hemleyê de Tirkiyê bi hemû derfet û hêza xwe xwest hemleyê asteng bike, ji ber ku wê dixwest pêşketinên QSD`ê asteng bike û dizanî ku QSD wê karibe Reqayê rizgar bike û metirsiyên li ser gel rake."
Mihemed li ser hîmên destpêkirina pêngava rizgarkirina Reqayî jî ev tişt anî ziman, "Di pêngavê de ya herî girîng jî rizgarkirina welatiyên bajêr ji zilma 4 salan bû. Lewma QSD`ê plansaziya rizgarkirina Reqayê amade kir û Hêzên Koalîsyonê jî destek dan QSD`ê. Destpêkê gundewarên derdora bajêr rizgar kirin û bajar xistin nava çemberê û paşê jî rizgar kirin.
Bi saya fedakarî û xwîna şehîdan bajarê Reqayê ji navendeke terorê veguherî navenda azadiyê.
Bi rizgarkirina Reqayê re, QSD`ê nîşan da ku ew li ku derê be bila bibe, ew ê karibin gel ji zilm û zorê rizgar bikin û hîmên demokrasiyê li tevahiya Sûriyê pêş bixin."
Endamê Desteya Serokatiya MSD'ê Hesen Mihemed di dawiya axaftinên xwe de piştî salekê li ser guhertinên ku li Reqayê pêk hatine ev tişt got, "Bi rizgarkirina Reqayê re em ketin pêvajoyeke nû; pêvajoya siyasî. Piştî ku çeteyên DAIŞ`ê li Reqayê şikestin û paytexta wan hilweşiya, niha ew tenê li Dêrazorê mane, li wir jî hêzên QSD`ê hemleyê dewam dikin ta ku tevahiya gundewarên Dêrê ji çeteyan rizgar bikin.
Reqa jî niha xwe bi xwe bi rêde dibe. Wê bi avakirina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê re, serkeftinên leşkerî bi serkeftinên siyasî tacîdar bibe. Reqa wê ji bo tevahiya Sûriyê bibe mînak. Reqa wê bibe navendeke sereke ya dîplomasiyê û wê hemû hêzên siyasî yên muxalefetê bîne cem hev"…*ANHA*

## Aloziya Sûriyê wê bi Netewa Demokratîk çareser bibe



Hevserokê PYD`ê Şahoz Hesen diyar kir çareseriya aloziya Sûriyê bi projeya netewa demokratîk a ku li Rojava û Bakurê Sûriyê pêş dikeve wê bi dawî bibe.
Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) bi armanca nîqaşkirina rewşa siyasî ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê civînek li Dêrikê lidar xist. Bi dehan malbatên şehîdan ên herêma Dêrikê û endamêm partiyê tev li civînê bûn.
Civîn li navenda Yekitiya Ciwanên Rojava hate lidarxistin. Hevserokê Partiya Yekitiya Demokratîk Şahoz Hesen di civînê de axivî û wiha got: "Ji ber ku dewleta Tirk dewtwerdan li Sûriyê kir û piştgirî da komên çete vê yekê hişt ku şoreşa Sûriyê ji rê derkeve û aloziya Sûriyê kûrtir bibe."
Hesen wiha dewam kir: "Armanca dewleta Tirk a dagirker ne piştgiriya şoreşa Sûriyê bû, armanca xwe derbkirina destkeftiyên şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê bû, di vir de jî sedema sereke dijmintiya li dijî Kurdan bû."
Hesen diyar kir ku dewleta Tirk li beramberî têkbirina projeya Netewa Demokratîk û qirkirina Kurd gelek tawîz daye Rûsyayê û destnîşan kir ku ev lihevkirin demkî ne û li ser bingeha berjewendiyan e.
Şahoz Hesen wiha dewam kir: "ENKS`ê bi piştgiriya dagirkirina Efrînê û avakirina meclisek herêmî ya wan koman, roleke neyînî lîst. Partiyên Kurd ku di bin banê Îtîlafa Sûriyê û dagirkeriya Tirk de dixebitin, ji destpêkê ve li dijî projeya Netewa Demokratîk bûn."
Hevserokê PYD'ê Şahoz Hesen di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku çareseriya aloziya Sûriyê ew ê bi projeya neteweya demokratîk ku li Rojava û Bakurê Sûriyê pêk tê, bi dawî bibe…

## Li Efrînê paqijiya etnîkî tê kirin


Mûrat Karayilan bêdengiya raya giştî ya navneteweyî ya li pêşberî dagirkirina Efrînê rexne kir û diyar kir ku li herêmê paqijiya etnîkî tê kirin.
Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan bû mêvanê bernameya taybet a Stêrk TV, tecrîda li Îmraliyê û rewşa dagirkeriya li Efrînê, nirxand.

### TECRÎD LI DIJÎ MIROVAHIYA PÊŞVERÛ YE'

Karayilan bal kişand ser paradîgmaya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a li nava mirovahiyê deng vedaye û wiha got: "Tecrîdkirina Rêber Apo tecrîdkirina şexsekî nîne. Tecrîdkirina gelekî bi tenê jî nîne. Ev yek tecrîdkirina demokrasî û azadiyê ye, tecrîdkirina mirovahiya pêşverû û gelên bindest e.
Eşkere ye ku tecrîdkirina Rêber Apo ancax bi têkoşîna gelê me û hemû bindestên ku baweriya xwe bi xeta Rêbertî aniye wê bê rakirin. Ji bo vê jî pêwîstî bi kar û rêxistinbûneke xurtir heye. Lewma divê em ji 20 salên bihurî dersê derxînin, kêmasiyên xwe bibînin, wan ji holê rakin û bi hêza rêxistinbûyî ya gelan û bi pêşengiya gelê Kurd tecrîdê teqez rakin."

### PEYMANA LI SER ÎDLIBÊ KONJONKTURÎ YE

Karayilan rewşa li herêmê jî nirxand û işaret bi peymana Tirkiye û Rûsyayê ya li ser Îdlibê kir. Karayilan diyar kir ku ev peyman demkî ye, ji bo demeke dirêj nîne û got, "Erdogan li Soçiyê li ber serokdewletê Rûsyayê geriya ûjê xwest ku heta biharê Îdlib di kontrola wan de bimîne.



Xwest bi vî rengî peymanekê çêbikin. Ji ber ku Erdogan siyaseta xwe ya şer li gorî hilbijartinên meha Adarê eyar kiriye. Erdogan baş pê zane ku eger beriya Adarê yanî beriya hilbijartinê ji Îdlibê derkeve wê di hilbijartinê de têk biçe. Ji ber vê yekê plansaziyeke wiha çêkir û hewl dide vê peymanê weke peymaneke mayinde ye nîşan bide. Halbûkî demkî ye û li gorî hesabên hilbijartinê yên Erdogan hatiye amadekirin. Bêguman qezenca Rûsyayê jî di vir de çêbûye ku pêşniyara Erdogan qebûl kirin."
Karayilan got, emrê vê peymanê kin e.

### LI EFRÎNÊ PAQIJIYA ETNÎKÎ TÊ KIRIN

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan bêdengiya raya giştî ya navneteweyî ya li pêşberî dagirkirina Efrînê rexne kir û got, li herêmê paqijiya etnîkî tê kirin.
Karayilan bi dewamî got, "Dewleta Tirk niha li Efrînê paqijiya etnîkî dike. Bala xwe bidinê; hêzên ku li pêşberî tecrîdkirina Rêbertî bêdeng in, dengê xwe li kiryarên Erdogan û çeteyên wî dernaxînin û bûne hevparê wî. Çima? Ji ber ku li Efrînê Kurd hene, li vê derê sûcê li dijî mirovahiyê tê kirin. Ka saziyên mafên mirovan ên navneteweyî hebûn, li ku ne ev sazî? Sirgûn, tehcîr û komkujî li ser şêniyên Efrînê tên ferzkirin. Erebên ku ji Gûta û deverên din hatine anîn li Efrînê tên bicihkirin. Gelê Efrînê ji mal û gundên xwe tên qewirandin. Hêzên navneteweyî tenê li rewşê temaşe dikin, ji ber ku ev li hesabê wan jî tê.

### WÊ HESAB JI HEWLDANÊN QIRKIRINÊ BÊ PIRSÎN

Bila gelê me û her kes baş zanibe, wê hesab ji hewldanên qirkirinê yên faşîst were pirsîn. Bila nebêjin ku komkujî, tehcîr û paqijiya etnîkî wê ji wan re bimîne. Hêz û feraseta siyasetê ya gelê Kurd heye ku vê têkoşînê bide. Di vir de ya girîng ew e ku gelê me li her parçeyî şert û mercan, firsendan rast bi kar bînin û têkoşîna xwe geş bikin. Şert û mercên heyî bi kêrî destketiyên gelên Kurdistanê û herêmê tên."



# QSD'ê pêşî li komkujiyên li Elmanyayê girt

**Çeteyê DAIŞ'î yê Tirk li girtîgehên li herêmên QSD'ê ku girtî ye destûr hate dayin ku bi nûçegihanên saziyên Elman NDR, WDR û Suddeûtscher Zeîtûngê re biaxive. Çeteyekî DAÎŞ'ê bi navê Ogûz G. diyar kir mîna êrîşên li Fransayê wan plan dikir ku li Elmanyayê jî komkujiyeke mezin pêk bînin. Lê di encama têkoşîna QSD'ê de çeteyên ku wê komkujî bikira nekarîn xwe bigihînin Ewropayê.**

Çeteyekî DAÎŞ'ê yê li Rojava girtî ye got, mîna êrîşên li Fransayê wan plan dikir ku li Elmanyayê jî komkujiyeke mezin pêk bînin. Eşkere bû ku bi saya têkoşîna QSD'ê, çeteyên ku wê komkujî bikira nekarîn xwe bigihînin Ewropayê.
Çeteyê bi navê Ogûz G. ku Cotmeha sala 2017'an ji aliyê Hêzên Sûriyeya Demokratîk ve hate girtin, ji medya Elman re axivî.

### KOMKUJIYEKE MEZIN A MÎNA PARÎSÊ HATIBÛ PLANKIRIN

Çeteyê Tirk li girtîgehên li herêmên QSD'ê girtî ye. Destûr hate dayin ku bi nûçegihanên saziyên weşanê yên Elman NDR, WDR û Suddeûtscher Zeîtûngê re biaxive. Di hevpeyvînê de eşkere bû ku pêşî li êrîşeke mezin a li Elmanyayê hatiye girtin.




Ogûz G. komkujiya li Fransayê bi bîr xist ku Mijdara 2015'an pêk û 130 kes mirin. Ogûz G. diyar kir, plan hatibû kirin ku komkujiyeke bi heman rengî li Elmanyayê jî were kirin.
Li gorî vê îdîayê, ku NDR, WDR û Suddeûtsche Zeîtûng bi rayedarên Elman re jî dan piştrastkirin, DAÎŞ'ê dixwest ji bo vê plana komkujiyê 3 çeteyên xwe bişîne Elmanyayê.

### KESÊ KU PLAN JÊ RE HATE GOTIN JI ÎSTÎXBARATA ELMAN RE DIXEBITÎ

Hevsera Ogûz G. Marcîa M. ji kesekî li Elmanyayê re qala planê kir û xwest wî bi rêxistin bike.
Ji ber ku ev kes sîxurê rêxistina îstîxbaratê ya Elman bû, plan jî eşkere bû. Nayê zanîn bê rola Marcîa M. û Ogûz G. a di planê de çi ye, lê belê serkêşê planê çeteyê DAÎŞ'ê yê bi navê Thomas C. bû ku bi xwe Swîsreyî ye. Tê texmînkirin ku Thomas C. di şerê bi QSD'ê re miriye.
Eşkere bû ku êrîşkar wê bi sê koman êrîşeke bombeyî bibira ser festîvaleke muzîkê ya li Elmanyayê, ya jî mîna êrîşa li Parîsê wê komkujiyek bikira.

### BI SAYA QSD'Ê, KOM NEKARÎN XWE BIGIHÎNIN EWROPAYÊ

Bi saya operasyonên QSD'ê ku ne tenê li Rojava, li gelmeperiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê derbên giran li çeteyên DAÎŞ'ê xist, têkiliya çeteyan ji hev qut bû û nekarîn ji herêma operasyonê derkevin. Tê texmînkirin, hinek ji çeteyên her sê koman ji aliyê QSD'ê ve hatine bêbandorkirin.

## Pisporên hiqûqê wê qedexeya li ser PKK'ê nîqaş bikin

Qedexeya li ser PKK'ê ya li Elmanyayê ketiye sala 25'an. Zerarên ku qedexeyê daye Kurdan û demokrasiya Elmanyayê wê bi konferansekê werin nirxandin.



Ji organîzatorên konferansê Dr. Elmar Mîllîch got, "Em ê stratejiya xwe ya li dijî qedexeyê diyar bikin."
Qedexeya li ser PKK'ê ku bi biryara hikumeta Elman a federal a wê wextê roja 26'ê Mijdara 1993'an hate dayin, kete sala 25'an. Ji ber sala 25'an wê 20'ê Cotmehê roja Şemiyê li paytext Berlînê konferanseke berfireh were lidarxistin. Di konferansê de wê zerara ku vê qedexeyê daye gelê Kurd û demokrasiya Elman bê nirxandin. Konferans bi sernavê "Qedexeya li ser PKK'ê ya 25 salan - Zexta 25 salan û demokrasiya Elman a di xizmeta siyaseta derve de ye" were lidarxistin.
Konferans wê li salona avahiya "Karl-Lîebknecht-Haûsê" pêk were û ji aliyê Komeleya Azadî, Komeleya Navneteweyî ya ji bo Demokrasî û Mafên Mirovan (MAF-DAD), Komeleya Hiqûqnasan a ji bo Mafên Mirovan û Demokrasiyê (EJDM-ELDH) û Rêveberiya Federal a Roten Hîlfe ve tê organîzekirin.
Kesayetên ku bi salan e li dijî qedexeya li ser PKK'ê têdikoşin û pisporên hiqûqê wê di konferansê de li hev bicivin. Ji rêveberên Komeleya Azadî Dr. Elmar Mîllîch li ser amadekariyên konferansê ji ANF'ê re axivî. Dr. Mîllîch diyar kir ku amadekarî qediyane û bi bîr xist, qedexeya li ser PKK'ê ku bi siyaseta derve ya Elmanyayê ve girêdayî ye, 25 sal in bi rengekî bê navber dewam dike.
Dr. Mîllîch got, li gel qedexekirina PKK'ê par sembolên PYD, YPG/YPJ'ê jî hatine qedexekirin û anî ziman, dewleta Elman pêkanînên xwe yên li dijî Tevgera Azadiyê ya Kurd timî weke amûrekê li hemberî Tirkiyeyê bi kar aniye. Dr. Mîllîch ragihand, Elmanya li dijî Kurdan li şûna pîvanên dewleta hiqûqê ji xwe re berjewendiyan esas digire.

### ÇEPGIRÊN ELMAN JÎ DI HEDEFA DEWLETÊ DE NE

Parêzvanê Mafên Mirovan ê Elman Mîllîch işaret bi stratejiya Elmanyayê ya li dijî PKK'ê kir û got, "Li Elmanyayê nifûseke zêde ya Kurdan heye. Ji ber vê yekê jî qedexe û astengiyan hîn bi rêk û pêk didomîne."
Dr. Mîllîch got, di konferansa roja Şemiyê de wê hewl bidin stratejiyeke hevpar a têkoşîna li dijî qedexeyê zelal bikin û wiha dewam kir: "Em ê li ser nîqaş bikin bê ji aliyê hiqûqî ve çi dikarin bikin. Bi taybetî ji bo rakirina qedexeya li ser sembolên PYD, YPG/YPJ'ê em ê nîqaşan bikin. Wekî din em ê li ser zextên ku dema dawî zêde bûne biaxivin. Ji ber ku zext êdî ne tenê li Kurdan tê kirin, çepgirên Elman ên destekê didin Rojava jî bûne hedefa dewletê."

## Bila dagirker ji Efrînê werin derxistin

Partiyên siyasî û saziyên sivîl ên bajarê Helebê, kiryarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê şermezar kirin û gotin: "Efrîn li ber çavên cîhanê hate dagirkirin."
Di çarçoveya şermezarkirina hovîtî û kiryarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê, Partiya Yekitiya Demokratîk, Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Partiya Pêşerojê ya Sûriyê, Meclisa Sûriya Demokratîk MSD, Hevbendiya Niştîmanî ya Demokratîk, Tevgera Civaka Demokratîk, Kongreya Star, Saziya Malbatên Şehîdan, Mala Êzidî, Komeleya Olan û Rûspiyên Êlan daxuyaniyek hevbeş dan raya giştî.
Daxuyanî li ber avahiya PYD`ê bi 4 zimanan; Kurdî, Erebî, Îngilîzî û Tirkî hatin xwendin.
Daxuyanî wiha ye:
'Em dagirkeriya Tirkiyê a xaka Sûriyê û kiryarên wê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li dijî gelê Efrînê yên weke kuştin, revandin, girtin û destdirêjî , şermezar dikin.
Dagirkeriya Tirk bi êrîşên xwe li dijî gorên şehîdan ên Efrînê, wêrankirina perestgehên olî û bi taybet ên Êzidî, pêkanîna guhertina demografîk, ferzkirina siyaseta tirkirinê û zimanê Tirkî, dizîna bermahiyên dîrokî û talankirina şûnwaran, qirkirina nasname, çanda gelên herêmê, dîrok û şaristaniya wê armanc dike.
Dagirkeriya Tirk li Efrînê ne tenê sivîlan lê belê xwezayê jî qetil dike. Bi sed hezaran darên zeytûnê yên welatiyan qut kir, mewsima zeytûnê talan kir û daristan şewitand.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê alên xwe li ser dibistan, navend û saziyan daliqandin da ku dagirkeriya xwe rawa bike.
Ev hemû kiryar û dagirkirin li ber çavê cîhana ku banga azadî, demokrasî û mirovahî dike, pêk hat.
Ji ber wê em bang li civaka navdewletî, Neteweyên Yekbûyî, rêxistinên hiqûqî û navdewletî dikin ku zextê li hikumeta AKP'ê ya faşîst a ku Erdoganê terorîst nûnertiya wê dike, bikin û rê li ber kiryarên li dijî welatiyên Efrînê de bigirin. Bila dewleta Tirk ji xaka Sûriyê vekişe û dewletên navneteweyî garantî bidin da ku welatî vegerin malên xwe.
Her wiha em bang dikin ku sûcên li Efrînê pêk tên werin lêkolîn kirin û sûcdaran radestî dadgehên navdewletî bikin."



## 2 şertên esasî ji bo çareseriyê



Mihemed SEYDÎ

Dema em behsa Sûriyê dikin çend salên aloziyê tînin ziman. Dîsa qale çareseriyê, rêbaz û riyên dîtina wê dikin. erê raste çend salin li Sûriyê alozî heye lê qeyran û pirsgirêk ji salên dûrûdirêj û ji bingehê sîstemê tên. Gotin û gefên ku herî dawî yek ji wezîrên rêjîma Sûriyê Welîd Mielim li ser herêmên ku bi berdêla xwîna bi hezaran zarokên vê axê hatine rizgarkirin vê zihniyet û hişmendiya bi pirsgirêk û qet nehatiye guheritn piştrast dike. yê ku bala xwe bide axaftinên rayedarên rêjîmê wê bibêje li vî welatî şoreş nebûye, bi hezaran gelê Sûriyê serî li ber zilm, dizî û talanê ranekiriye. Mêjî û hişmendiya faşît a Beis hîne jî wekî xwe ye û ya ku diyar dibe wê qet neguhere. Bi hezaran kes; zarok, jin û kesên Ixtiyar hatine kuştin, Rêjîm dibêje em bi serketine. erê em jî dibînin ku rêjîm bi serketiye lê di çi de bi serketiye ew jî mijarên mirov dikare binirxîne. Ew kuştina bi hezaran welatiyên Sûriyê de bi serketine. bi firotina welat ji bo dagirkeran bi serketine. bi koçberkirina bi hezaran malbatan bi serketine û hîne jî serketin û serketinên din di xirabiyê de.Êdî navê vê hişmediyê ku hîne jî wekî dîwarekî qet naguhere Ehmaqî ye. Ji bo çareseriyê û diyalogên dîtina çareseriya ku berjiwendiyên gelê Sûriyê diparêzê bang ji aliyên bakurê sûriyê ve tên kirin ku divê Sûriya demokratîk bibe û diyaloga Sûrî-Sûrî pêşbikeve. Beriya demekê diyalog ket rojevê lê tevî ku danûstandin çêbibin jî wê çareserî nebe ger ku 2 şertên esasî bi cih neyên.
Yek ji wan şertan; dawî li dagirkeriya li ser axa sûriyê were. Yên ku gefan li Rojhilatê Firatê dixwe (Rêjîma Sûriyê) gelo dagirkeriya dewleta Tirk nabîne ku behse serketina xwe li dijî terorê dike (li gorî ew wiha pênase dikin). ketina Cerablus heta Idlibê û herî dawî jî dagirkirina Efrînê li pêş çavên rêjîmê pêk nahat ku ger ne bi erêkirina wan bû.
Ji bo wê, derxistina dagirkeriya dewleta Tirk û paqijkirina herêmên bakur-rojavayê Sûriyê ji çeteyên El-Nûsra, bermahiyên DAIŞ'ê û el-qaida şertekî esasiye ji bo çareseriyê ye.
Şertê din jî ew e şerê li dijî DAIŞ a xeteriya wê heta niha li ser herêmê heye divê pêk bê.
Daxuyaniya Sererkanê hêzên Emerîka Cozêf Donford ku dibêje heta niha derbasbûna çeteyên biyanî ji bo sûriyê û Îraqê bi armanca tevlîbûna nava DAIŞ'ê dewam dike, hevkariya dewleta Tirk û çeteyan ku heta niha didome diyar dike.. dîsa her ku şervanên QSD'ê li Bajarokê Hecîn û derdora wê derbê li çeteyan dixin, serekçete Erdoganê jî derdikeve û gefan li Rojhilatê firatê dixwe. Ji ber li rojhilatê firatê beşek ji çeteyên wî têk diçine û çavên wî tehemûl nake.
Di demeke ku hêzên Bakurê Sûriyê li herêmên Dêrazorê şerê çeteyên DAIŞ'ê dikin gefên dewleta Tirk û rêjîmê li ser hêzên li dijî DAIŞ'ê têdikoşin hemwextî hev dîsa tên. Rêjîm Sûriyê wek dewleta Dagirker a Tirk gefan li ser rojhilatê Sûriyê dixwe ku projeya guncaw ji bo hemû gelê sûriyê li wir pê tê. Ev gefên ku tên xwarin wekî derba li piştê tê dîtin ku li Hêzên dijî DAIŞ'ê şerdikin tê xistin..Gelo haya rêjîmê ji heye ku bi van helwestên xwe hizmetê ji dewleta Tirk re dike û Li pêşiiya şerê li dijî DAIŞ'ê astengiyan derdixe.
Li şûna hemû gef û tehdîdan, diyalog û proje pêwîste. Ew jî bi pêkanîan herdû sertên me li jor anîn ziman tenê pêk tê. Ji derveyî wê hemû hewldan badil hewa ne..